

## *Pêdaçûn (Mubalexe)*

### *Di helbest û beyta kurdî ya klasîkî de*

(1)



05.08.2009

**Pêdaçûn** (*Bi Kurmanciya jêrîn ,Sorani': Pêwedan*) ew şêweyê axiftin û nivîsînê ye ku mirov tiştan pir mestir ji rewşa wan a rastîn bike, ji aliyê jimar û babet û rewşt û taybetiyan ve...Di zimanê Erebî de jêre „**Mubalex'e**” têye gotin. Li ba hozanvanên ereb ev şêweyê hunera wêjevanî pir hezkirî bû. Li ba hozanvanên Kurd jî ev hunera wêjevanî heye û balkêşe, tevî ku hozanvanên me yê mezînin bi pîranî oldar bûn, lê dîsa jî wan dest avêtiye vê hunerê û ji xwe re bi kar anîne, rast an ne rast, şaş an ne şaş...

**Melayê Cezîrî** di seriyê dastana xwe de dibêje:

***Newa ya Mutrib û çengê***

***Fîxan avête Xerçengê***

***Were saqî heta kengê***

***Neşoyin dil ji vê jengê***

*(Newa bi Farsî deng e. Çeng: aceteke sazpedakirinê ye)*

Ew dibêje ku dengê sazband û çengê nalîn gihande burca Xerçengê "**Seretanê**" ku li asîmanê ye... Eve jî tiştêkî ku têde pêdaçûn heye, ji ber ku çendîn dengên stranbêj û deholkut û çengan an çangan bilind be jî, dîsa nagihîne asîmanan...

Pişt re bi çend rêzikan dibêje:

***Dinalim şubhetê ree'dê***

Bi wateya ku nalîn û axîna wî wekî hurmîna e'wiran e...

Ew dîlbera xwe, çî ya rastîn û çî yê maa'newî, bi durre teşbîh dike û bi ser ve jî, dîlber dike **Belqîs** a ku şahdarî li memleketa **Seba** dikir û çêroka wê li gel pêxember **Sulêman** di **Qurana pîroz** de hatiye hewaldan. Ew jineka çeleng û jêhatî bû.

***Min dîlberek durr heye***

***Meh'bûbê şîrîn surr heye***

***Husn û cemalek pir heye***

***Belqîs sîfet, mesken Seba***

Dîtina dîlberê di hozanên kurdî yê kevnare 'klasîkî' de wekî durr û cewherê, an jî dîtina rûyê wê wekî heyvê, li ba gelek hozanavan têye berbiçavkirin, ne tenê li ba **Melayê Cezîrî**, tevî ku ev wekaniyeke pêdaçûnê ye, û diyare ew rewşt di wan deman de gelek hezkirî bû. Li ba hozanvanên ereb (1) jî ev dîmen pir heye....

Dîlber dibe dareke pelzêrîn an jî baxekî ji gulên...**Melayê Cezîrî** dibêje:

**Selwa rewan, zerîn wereq**

**Çîçek (Melê) dîn sed neseq...**

(*Wereq erebî ye: Pel, û neseq: rêz. Zerîn: ji rengê Zer hatiye*)

Jimareya (Sed) an (hezar) an jî (Bê hîsab) bo bêtirkirinê pir di helbestên me yê kevnare de tîn, li ba **Ehmedê Xanî** jî di dastana **Mem û Zîn** de heye.

**Melayê Cezîrî** di rewştikirinê de pir pêda diçe û ev pêdaçûn li ba wî êdî bûye bingeheke hozanvaniyê ku nema dikane xwe jê azad bike. Binêr ew çî dibêje:

**Xedenga furqetê ree'd e**

**Dilê ew x'efletê lêdit**

**Dibêjim wer cebel bit**

**Ew biker bit wî di gavê da**

(*Xedeng: Tîr. Ree'd bi Erebi ye: Hurmîna e'wiran. X'eflet jî bi Erebi ye: Ji xwe çûna dil*)

(*Wer: di vir de „wek“...*)

Em dibînin ku ew tîrên dûrketinê wekî hurmîna e'wiran gava têye guhan teşbîh dike, eve jî pêdaçûneke ne piçûk e...

Sohtîna perwaneyê di helbesta kurdî ya kevnare de li ber nûr û şewqê jî pir hezkirî bû, eve ne tenê wekî „wekaniyê“ têye jimartin, belku yek ji balkêştirîn şeweyên pêdaçûnê ye di hozanê de:

**Gelo, dîsa bebînim ez**

**Çirayê wesletê hilbit**

**Bisojim şubhê perwanê**

**Di ber wê nûr şewqê da**

Li dereke dî hozanvanê me yê dil tijî liyanî „eşq“ xwe wekî çiyayê **Qendîl** bi hêz dibîne, û bi wê wekaniyê tenê nake, ew xwe bi „Fîl“ jî dide teşbîhkirin, ji ber ku kanîn û tewata fîl pir e:

**Tu narê firqetê zanî**

**Dikarim ez teh'emul kem**

**Diyare kohê Qendîl im**

**Meger fîl im di eşqê da**

Di hejmartayînê de Melayê me ji "Hezar" hildikişê "Bê jimartinê" û dîsa dadikeve "Sed", kêmtir na:

*Min di dil kovan hezar in*

*Dax û keyber bê hîsab*

*Mîh'neta werdên bi xar in*

*Wên di dil da sed nîşab*

*(Werd bi Erebî ye: Gul. Nîşab jî bi Erebî ye: Tîr)*

Ew peveka xwe pêşûpaş dike, dibêje:

*Sed nîşab in min di dil*

*Îro ji xarên sorgulan*

*Yek bi yek peykan çevî bûn*

*Çûne cergê da kulab*

Li ba Melayê Cezîrî awirên çavên dîlberê tîr û xedeng in, dil û cergê wî ji ber wan bi kovan û kul in, ji wan xûn wekî coyên avê, hema tijî xûn sor wekî e'qîq û zox a wekî erxewanê dixulxulin, eve jî pêdaçûneke qatqatî di ser hev re bilind dibe, ku ji aliyekî ve helbestê xweşiktir û balkêştir dike û ji aliyekî ve bi wêneyan berhemdar dike, hema pêdaçûn pêdaçûne, û hozanê ji jîhana rastîniyê radike dibe jîhana fantazî û pêjiniyê:

*Dîlberê îro seher avête cergê min du dox*

*Yek li sîne, yek li dil da, lew ji min tîn ax û ox*

*Ah û oxên min ji dil tîn, lê ji ber tîra qizil tîn*

*Yan ji kovanên di kul tîn, jê dizît her xûn û zox*

*Xûn ji dil co co rewan tê, wek e'qîq û erxewan tê*

An jî li vir binêre, ka Melayê me gihaye çî pileya pêdaçûnê, ku tew nakve hişan, hema pir xweşik û nazik di mijara xwe de dimîne:

*Ger bipirsit carekê xatûn li h'alê suxteyî*

*Qifl û zincîr dê vebin, bê îsm û dest û mifte ye*

*Bend û zincîr dê vebin, cerhên di kul dê xweş biket*

*Lew ku navê dîlberê, dermanê derdê bend ye...*

*(Qifl bi erebî ye: Kutik kilît dikevêyê. Cerh' "Curh'" erebî ye: Birîn. Mifte erebî ye: Kilît)*

Gava dîlber li wî bipirse, wê dergahên zindanê ji xwe serê vebin, wê birînên wî xweş bibin...Bo çî? Ji ber ku navê dîlber dermanê derd û kulên girtî ye...Hema wekî ji "nav" dixuye, mebesta Mele pir balatir e ji dîlbera mirovî...Belku tenha navê Xwedê tea'la dermanê derd û kulan be...

Carina pêdaçûn a wekî va rewşta ku hozanvanekî kevnare yê ereb anî bû: **(Rûyê te heyv e û bejna te rum e)** helbestê wêran dike. Dibe ku di wê demê de ev dîmenekî pir çeleng bû, hema niha nîşanên tirafîkê "*Lewh'ên hatûçûnê*" tîne bîra mirov...

Mixabin li ba **Melayê Cezîrî** hinde rewştên wilo yên ne nazik hene, wekî:

***Mela, me li gerdena dîlber ji nosed bûse mayin deyn...***

Gerdenê (stoyê) dîlber wekî yê ajalê efrîqayî yê ku histoyê wî pir dirêj e, ji nehsed bostan e. Eve jî dîlber ji mirovatiya resen û naskirî bi dûr dixîne û wekî giyanwerekî nenas dide xuyakirin. Heger **Mele** yekser bigota ku dîlber wekî **Zerafê** ye, wê baştir û ciwantir ba ji pîvana gerdenê wê bi bostan û bi dayîna jimareya nosedî.

-----

(1) *Navên Kurd û Erebo û her navekî wekî wan pêwîste bi tîpên gir dest pêbike, hema gava ew nav wekî rewşt (sîfet) hatibe, pêwîste bi tîpa hûr dest pêbike: Kurd hatin...Helbesta kurdî...*

(2) *[Bermayî heye]*

00000000000000000000